



Nama zanyarîyê li ser zewacê li Swiss: Maf û wezîfe

Ev agadarîyên li jêr bi kurtî li ser maf û wezîfên zewacê li Swiss radiweste. Tesîrekî wanên huquqî tune. Pîvan yasayên, ku derbas dibin in.

Dairîn zewacê yê Swiss û wekîlên dairê zewacê yê dervayê welat, ku ev nama zanyarîyê didin, herweha sazîyên konfederatîona Swiss di bin mecburîyeta, ku agahîyên berfireh bidin da ninin. Ji bo pirsên di derbarê vê nama zanyarîyê serî li cîyên şewirmendîyên dadwerîyê bixin. (Cîyên şewirmendîyê, Parêzer, Noter û hwd.)

Maf û erkên zewacê li Swiss

Ev xalên jêrîn maf û erkên zewacê yê li gor qanûna Swiss in. Rêzkirina van xalan rastgele hatîye kirin û ev xal ne dawî ne.

- **Mirov dikare piştî 18 salan bizewice:** Li Swiss emrê zewacê ji bo mêran û jinan 18 sal in. Wextê herdû alî 18 salên xwe temam bikin, dikarin bizewicin.
- **Herkes dikare hevala xwe/ hevalê xwe bi azadi helbijêre, nabe, ku kesek bi zorê bê zewicandinê:** Zewac bi daxwaza azada her du alîyan tê kirin. Bê daxwaz mara kesek nayê birîn. Tu kes bi zorê nayê zewicandin. Nabe, ku kesek bê daxwaza dilê xwe mêcbûrê zewacê bê kirin.
- **Erkê dilsozî û alîkarîyê ya zewacê heye:** Herdu alî berxweda didin ji bo başîya bi hev ra jîyanê û rêz li kesayetiya hevala xwe/ hevalê xwe digire. Tu alîyek li dijî daxwaza alîya din tiştek nake.
- **Di her tiştên girîng da mafên wekhev ji bo jin û mêr:** Di her warî da mafê gotinê ya jinê wekî ya mêrê heye, nêrîna wê jî wekî nêrîna mêrê tê hesibandin. Girîngîya gotina jinê jî wekî ya mêrê ye.
- **Yeksoziya parvekirina karên zewacê: (Karên derê malê, karên malê):** Ji ber, ku mafên her du alîyan jî wekê hev e, dabeşkirina karan li gor cinsiyetê nabe. Ew karên, ku di zewacê da hene, karên hevbeş in. Her du heval di navbera xwe da gotina xwe dikin yek, ku kî çi karî digre ser milê xwe.
- **Bi hev ra debara malbatê kirin:** Li vir jî dabeşkirina kar ne li gor cinsiyetê dibe, her du heval wezîfedarin, ku debara malê bi hev ra bikin. Her du bi hev ra dibin yeksoz, ku kî çiqas ji bo debara malê dikare bike.
- **Xwedîkirina zarokan hevbeş e:** Her du heval wezîfedarin, ku li zarokan mêzebikin, wan xwedî bikin, wan perwerde bikin û wan ji xeterîyan biparêzin.
- **Zordestî di zewacê da tune:** Kî li hevala xwe /li hevalê xwe bixe, an jî ezîyet lê bike, tê ceza kirin. Mafê mêrê tune, ku li jinê bixe.
- **Mafê her alîyê heye, ku parastina qanûnê bi kar bîne, wextê alîya din erkên zewacê bi cî neyîne:** Ger hevalek wezîfeyên xwe yê ji bo malbatê bi cî neyîne, an jî her du alî ji bo karekî girîngê malbatê ne yeksoz bin, ew dikarin bi hev ra, an jî bi tenê mehkemê ji bo navberdîtinê têxin navberê.
- **Mafê her kesî / her kesê heye, ku zewacê betal bike:** Zewac bi telaqê betal dibe. Eger her du alî bixwazin hev berdin, ew her du dikarin bi hev ra ji mehkemê dawa telaqê bikin. Eger yek ji wan her duwan tenê hevberdanê dixwaze, wê wextê ew alî dikare serî li dadê bide û dawa telaqê veke.